

stê xwe dirêj dike. H. Pîrê jî bi lerizandineke bê wate, cixarê davêje û, bi piştxûzî bi destê wî digre.

- Hûn çawa ne.

- Başin. Me tu nas nekir.

- Ez Hesên im. Min navê te birî, bavê min navê te li min kirî. Çilpikeke xwêdanê dikeve ser lêvên wî û şorbûneke ziwa di sîngê xwe de hest dike.

- Kîjan Hesên.

- Hesênê Pîrê, ez kurê Xelîl yê mezin im û diya min... tu wê nasdikî ku, çiqwas ji te hezdike. Xwest bêje ku "tu li ser destên diya min mezin bûye" lê tirsîya bi wateya parskirinê bê fêmkirin.

- Belê.. belê, tu çawa yî.. çî li gund çêbûye. Her ku gundiyeke wî dihat, ev pîrsa wî ya pêşî bû.

- Ev bû çend mehên min in, min gund nadîtiye. Hesên bi riwekê beravêtî got. Ew li benda gotina keremke bû û her dereng dibû ew bêtir dadirivî.

- Te çikirî. Bi riwekê sar û dilekê germ pîrsî.

- Na.. min mala xwe aniye vê derê. Dilê mêrik sar dibe û hêviya ku ji xwe re çandibû, dê hinek pere jê re bîn, tê mirandin.

- Bi bore, emê derbas odê bibana lê ez bi sozekê ve girêdayî me. Te çî dixwest. Hesênê Îbo dipirse.

- Ne tişt. Min xwest silavekê li we bikim, bes xûya ye hûn ne vala ne, bi xatrê we, ezê careke din bêm cem

we. Dengê derî pišta wî rast dike û cixareyekê ji bêriya xwe dikşîne; "Tufî.. çima min ewqasî fedî dikir û evqas xwêdan ji bo çi... Ma ne em merivê hev in, çima jê fedî bikim... kuro, meriv ji ku û hal ji ku, hema negot derbasî hundir be.. Bes mêrik got sozek min heye û ev ne gunde. Çiqwas car te bi xwe gotî ku sinc û rewşa bajêr û gundiyan li hev nayê". Bi van pirs û sîberan ew ketibû hewşê û pîrekê bi pirsên xwe ve êrîşî wî kiribû.

- Mêrik qedrê mala xwe digre. Ez lê bûme mêvan û min dîtî. Gotina cîranekî wanî gund tê bîrê û H. Pîrê berkenî dibe, hêviya veqera cem wî, careke din şîn dibe û avê bi ber dilê xwe direşîne.

- Ewê alîkariya min bike; sedî- sed mêrik dê bigota; keremke eger sozeke wî ye piwîst tineba. Ezê careke din herim cem û binêrim dê ji min re çi bike. Di vir de, pîreka wî dikeve hundir û bi riwekî sar dibêje, 'Hevalêkî te li ber deri ye". Hesenê Pîrê bi laşekî sist radibe ser xwe û derdikeve.

Çend rojên din diborin, dilopên pîrekê zêde dibin û qîra Hesen jî bilind dibe. Demên ku pîrekê mesele ji bîr dikir jî, wî ji vir ji wir gotin davêtin wê da ku careke din dilopên xwe bi ser wî de biweşîne, heya hêşt di rojê sar de û bi dilekî lertzokî, li pêş deriyê H. Îbo bisekine û careke din, bi dîtina riwê keçikê re, destên lertzokî di piş xwe de vedişêre û dihêle keçik rûkenî verê

bibe.

- Biner, emê bi pirsin da ku em karekî boneya te bibînin, bes divê tu ti serêşiya ji me re çênekî. Hesenê Îbo dibêje û carekê- dudiwan bi çavsorî li pîreka wî dinêre. Piştî berger û dilopên wê, H. Pîrê digel pîreka xwe hatibû cem merivê xwe yî serdest û vêcarê ew bi riwekî din hatibû pêşwazîkirin û piştî ku çêroka hatina xwe jê re gotibû, mêrik bi kurtî gote wî ku dê binêre..

- Ez benî, ez mirovekî bi tenê me, ezê çi pirobleman çê bikim û ji bo çi. Ez li karekî digirim da ku seriyê xwe û pîrekê ji meseleyên wilo bi parêzim. Hesen di vir de ber bi pîreka xwe dinêre ku, ew jî bi çavin e nîv-damirandî li mêrik dinêre; "Tufî li pariyê nanê di nav pêsiyê de, çi genî ye. Ew jî ji bo min bi stûxwarî li ber wî digere". Pîrek jî ketibû nav saw û sîberan û pir hêvî, xwestek di çavên H. Îbo de naskirin. Çend rojên din diborin. Pîrek, careke din, dilopên sar bi ser wî de dibarîne. Vê carê bihnê li wî teng dike.

- Ewê ku bixwaze kar bi dest bixîne, divê hertim bi-pirse û gereke tu merivê xwe jî bîne cem me da em xwarinekê bidinê. Pîreka Hesen, sibê- êvarê, digote wî û her car xwe ji şerekî re amede kiribû. Li dawiyê xwasteka wê bi cih hat û merivê mêr, gumana wê nêperçiqand; Ew di rojeke îne de bû mêvanê wan.

Çend rojên din diborin. Hesenê Pîrê dibe xizmekarê

dibistanekê. Standina xwendina lîsê hêviyek dabûyê ku dê di dibistanekê de bibe mamosteyê zarokan, lê mixabin ji bilî karê xizmekariyê tutişt bi dest neket. Ew ji sibeyê ve ji mal derdikeve û heya piştî berdana zaroyan bi çend katan jî, di paqijkirina odeyan de kar dikir.

Di rojên pêşî de, bi pozbilindî û bi riwekî geş ji mal derdiket, nemaze piştî ku dilopên pîrekê hatibûn birîn, lê ev dilgeşî, bi pêvajoya rojan û riwê serdestên dibistanê û fermanên wan re, tê vemirandin. "Mirov sewalekî kedî ye, bes çima ez kedî nabim. Ma ne evqas kesên evî bajarî eynî wekî min dijîn, her yek dixwaze seriyê wî yê herî mezin be. Em tev werimî ne, werimandineke bê zayîn; me teva xwe bi bê avis kirî, zayîn ji ku heye. Cudayiya di navbera me de ew e; ku, em hinek ewê yekê zanin ku werimandina me bakî ye û yê din çavên xwe li ser vê rastiye digrin". Hesenê Pîrê gihîştibû wê baweriyê ku bajar dê wî yan dîn bike yan jî dê bike merivekî bîrmend.

Nelihevkirina wî û rêvebirê dibistanê di sibeyekê de diteqe, Hesen mîna her roj, ji berî hemiyana gihîştibû wir û dest bi kar û barên paqijkirinê kiribû û ji berî hemiyana dest bi odeya rêvebir kirbû, ji nedî ve mişkekî xwe li nav nigên wî xist û hêşt piyala avê bi ser pelên ku, li ser masê bûn, birje. Bi boneya vê yekê dengê wan bilind bû û hêştibû xeleka mamosteyan li dora wan fi-

reh bibe. Ew bi bihtengê ji dibistanê derdikeve, hilmine kûr ji cixarê ber dide; "Xwe bi segîtiya xwe dibîne, seg kurê segan, eger ne di heyameke wilo de be dê buhaya te ne du pere bana jî. Tu kî yî; çavdêrekî bê rûmet î, karên we fesadî û...". Dengê nedî ku bi ser de kir qîreqîr, hêşt zincîra ramanan bişele.

- Bavê min li pêş xwe binêr. Du gav nemabûn ku teksî li wî bikeve. Hesenê Pîrê nêzîkî li mal kiribû û bi dilopên pîrekê diramî dê çî bersivê bide wê û gava merivê xwe yê serdest hate bîrê, berkenî bû û bi gotinên wî ramiya; "... Mêrik di pêşiyê de gote min ku, tu serêşiyên ji wî re çênekim û ewê li hemberî çî alîkariya min bike". Bi vê pirsê re ew derî vedike û bi dîtina sola merivê xwe ye serdest û kenê pîreka xwe re, di nîvê hewşê de dadirive.

Cindirês - 1999

ZÎNÊ

Dengê teqe-reqa ber bi ezman ve hildikşî, yekî li yê din guhdarî ne dikir, her çendekan bi ser hevdu ve dikir qîjeqîj û di nav re, carina dengê giriyê wan herdiwan bilind dibû û dikaribû bala yekî bi ser xwe de bikşîne.

Pîrekeke di hevdu de ye, bal û bejna wê dilê mêran geş dike û buharekê di çavan de diweşîne; te ne dikarî, zû-zû, temenê wê nas bikira. Ji cil û livên wê xuya dikir ku, di maleke dewlemend de xwedî bûye. Wê, bi hêzeke bê dilovanî, keçkeke heft salî hembêz kirî û kare di ber de şerê guran jî bike. Keçikê jî, herdu dest di nava wê re birine û, bi giriyekî şîn, hêsra dibarîne û her ku herdu mêrên, ku dixwastin wê ji hembêza pîrekê derînin, hewil didan xwe. Qêrîn û giriyê wan bilintir dibû û bêtir xwe bi hevdu ve girê didan.

Gava polîsan dît ku, çêrok dê bi şîniyeke giran û dijwar bidome, bêyî ku kes karibe wan ji hembêza hevdu derîne, yek ji wan peya dibe û li mêrê pîrekê dike qêrîn.

- Hey gidî! Me fêm kir ku tu di wê çêrokê de ne mêr î, lê di vê derê de jî tu tune yî?! Bilezîn û pîreka xwe bikişîne odê, berî ez çend şeqeman lê didim. Bi gotinên xwe re jî, wî çend xêzeran li mêrik dan.

Ew ji vê sibê de, ji dema ku derî bi hêz hate lêdan û dengê lingên hespa li hewşê bihîst, ji ser hişê xwe çûye. Memoyê Keleş ne dizanî ka ew xewneke pîs e, ku pîrhebokê konê xwe li ser ristiye, an jî lîstikeke qeşmeran li ber deriyê wî li dar xistine.

Tiştên dihatin gotin û bîstin ne diket bal û baweriya tukesî. Lêdanên xizêranan jî, ji aliyê polîsê peya bûye de, ne dihêşt ew ramanên xwe biref bike; cihê wan mîna şîşa êgir dişewitand û hêştin ku, bê naskirin, berve pîreka xwe here.

Pîreka hêç, mîna dêwekî diqîre û, bi veçerpîna laş re, wî û yê polîs li erdê digevizîne. Vê yekê hêşt hevalên ê polîs peya bibin û lêdanên xizêranan, bê hejmar û rênasîn, li ser laşê gundiyan şopên xwe bihêlin.

Di demeke din de bûya, kesekî dê nikarî biwa M. Keleş li erdê bigevizîne û nemaze ji aliyê kê ve; pîreka wî. Wî pênc jin anî bûn, yek jê ber dabû. Carekê, ji ber qirecira wan, ew birin ser benderan û carê yek dixist şûna bêrgîr û bi wê cercer digerand. Lê îro rojê taybet bû; zaroyekî pênc salî karî bû pêncî şeqemî li wî bide, bêyî ku bi wê yekê hest bibe.

Derengî şevê çavan vedike, ode bi mêvanan dagirtî ye û ev yeka jî, li gor jiyan û karên gundiyan, ne tiştêkî xurust e. Ew bala xwe didiyê ku, seriyê çend gundiyan wî şikinandî ne, xasekî sipî li dor seriyê wî jî geran-

dine. Oda jinan jî li aliyê hewşê yê din bû, lê dengê girî û nalînên Sînema Mistê bi ser gund keti bû. Di navbera xewnekê û xewnekê de, giriyê wê bilind dibû û siwarên reşiyê zikê wê diqelaştin, şûna dirask û neynûkên wan kûr dibûn. Çilpikên xwînê li dû hev têdizên û deziyê sor şopa xwe li erdê dihêle.

Di dawiyê de, û bi lêdana tomaqekî di paşiya serî de, ew ji ser hişê xwe diçe û, mîna leylanekê, wêneya keça xwe dişopîne çawa polîsekî ew avête pêşiya xwe û zengiya hespê xwe kuta.

Civata li mala M. Keleş, heya berbangê belav nebû, çendekên ku bi banga mele re rabûbûn jî, piştî nimêja sibê, tevî meleyê gund vedigerin odê. Bûyera îro, xew ji çavên tevan revandiye; piştî xwedîkirina heft salan, keçika wê jê bistînin!! Kesî ne dikarî vê çêrokê şirove bike û ewê ku girêka çêrokê di dest de, tevî siwarên reşiyê çû bû; wan herdu destên wî xistin bendê û li dû hespekî kişandin.

Civata oda mêran bizava xwe fikir ku, deng bi M. Keleş xîne, lê te digot qey pûtek e û li wê derê danîne. Wan dixwast ku, ew kela xwe birjîne; devê şikeft û çalên dûpişkan veke û lehiya reşiyê birjîne. Tevan dizanî ku, eger ew bêyî wê yekê ji odê der kevin, dê ez-mên bi ser seriyê pîrekên xwe de bîne xwar, û nemaze bi ser serê Sînemê de.

Lê ji bilî dengê qutiya titûn û mêtina cixaran, tu livên din ji wî ne dihatin. Mele jî ne dixwast, zû zû, xwe tevî meselê bike û ji rûmetgirtina xwe kêmbike. Lê tevî ku wî bi dengê xwast, ka ewê çibe û dê çarenûsa Sînemê çibe, dîsa jî deng bi M. Keleş ne ket, û piştî ku mele pirsaxwe dubare dike û bê bersiv dimîne, li wî pir zirt tê; regek diçe yek tê û bi bihntengî, tevî mirûdên xwe, ji civatê dikeşe.

Rabûn û çûna mele û mirûdan, civat ji hev şeland û di sînora mêtina çixareyekê de, kes di odê de nema. Lê hinekan xwe li ber gedûkê giran kir û ne durrî mala Memo rûniştin. Wî jî çixareyê nuh xisti bû nav lêvan û dimêt, çav di serî de vedibirûsîn û, mîna gayekî, çend caran bihn kişand û berda, her diçû bêvlên wî firehtir dibûn û yek çilpikên çilmê, bi berdana bihna wî re, diweşîn. Cara dawî, û bi berdana bihna wî re, deng bi ber odayên hewşê dikeve û veğerandina navê Sînemê ji her koşekê dadirive. Dema kes ne ket odê, hêz da xwe û, bi gihîştina ber derî re, dest avêt koşa ku çovê xwe tê de vedîşart û, bi qêrîn bang kir:

- Sîne... em. Sînem. Çêtir e ku tu mirî bî.

Memo bi hovîtiya xwe dihate nasîn, nemaze ji aliyê pîrekên xwe de, lê tevan jî dizanî ku, hez kirina wî ji Sînemê re bê sînore. Ew çar salan, bê zaro, li hêviya wê ma û tu jinên din nanîn ser wê. Eger bidîta ew ji

bona zarokan dêşe, dilê wê xweş dikir û jê re digot:
"Helbet Xwedê dê rojekê bi riwê me ve binêre û emê jî
bi zarok bibin".

Heya roja ku ew xisti bûn cercerê, ji bona ku kes ne-
bêje; "ji Sînemê ditrise", hêşt ew jî seriyê xwe têxîne
nîr, lê nehêşt mîna yên din cercerê bikşîne.

- Te çima li min wa kir, Sînem.

Ew di odê de mîna gayekî hêç û har diçû û dihat, tişt
nemabû ku dev ji şermiyê berde û here oda pîrekan,
Sînemê ji nav koma jinên gund bikişîne û bîne odê, lê
piştî mêtina ewqas çixare, hinekî hişê wî vejeriya bû û
ne dihêşt ew xwe, zû zû, di şaşiyên ke.

Derbasbûna komeke jin û mêr, careke din pî û mil li
wî sar kirin, lê yek caran hêrsa wî radibû û dikir rabe bi
porê Sînemê bigre û vegij-gijîne, lê xeleka mêvanan li
wî teng dibû û ew bê çare dima. Di dawiyê de ew dane
rûniştin, kesên lê civiya bûn bi tevahî ji malbatê bûn.

- Ka ji min re xeber de, te çima weha kir, heft-heşt sa-
lên tene ku tu bi min dikenî, çima... û kî ne evên
alîkariya te kirine. Wî ne dît ku polîsan H. Reşo jî bi
xwe re birin. Gava deng bi Sînemê ne ket, careke din
har bû û bi ser de kir qêrîn, û berî ew rahêje çovê xwe,
pismamekî wî gihîştê û çov ji dest girt.

- Te xêre tu har bûyî, rûmeta kesên dora xwe bigir... Ev
çi maleke dîn in. Wî Memo da rûniştin û çixareyeke